- 0033 *Min jî got here jî xwe ra yekê bi dilê xwe bibîne (...), bîne were, ez ê te bidimê.*
- 0034 *Me ji bona wî tu anî vira."*
- 0035 *"Ê baş e" dibê.*
- 0036 *"Madem kû qesta min kirîye, ez ê jî qebûl bikim."*
- 0037 *"Yalniz" dibê "şertekî min heye, yek şerteki min heye.*
- 0038 *Tu wî şertê min bi cî bînî tamam iş."*
- 0039 *Dibê: "Bêje ka şertê te çi ye?"*
- 0040 *Dibê: "şertê min ew e, ez mahra we dibirim.*
- 0041 *Hûn jin û mêrê hevin. Yalniz çil royê, hûn ê di nava cikî da rakevin, hûn karişê hev nabin, royê çiluyekî paşê tu serbestî."*
- he goes back and forth and notices there is a palace in the middle of the island.
- (He) approaches the palace, walking for a while, and opens the door of the palace, on entering he sees a solemn assembly sitting down inside.
- A man wearing an imam's robe, on his head a white turban, is seated in the midst of the assembly.
- (He) approaches saying "Selamun aleykum". "Aleykum selam" they greet him.
- The assembly falls silent. The man with the imam's robe who is seated in the midst of the assembly turns to the guest.
- (He) says: "Dear youth, how did you come here?"
- (The youth) says: "Heyran, by God I don't know how I got here.
- I was calling the prayers from the minaret, a dove came and alighted before me, I finished my prayers and thought that catching that dove would amuse me, it was such a fine animal, I would catch it then let it go.
- I reached out for the leg of the dove, but I did not take the dove, the dove took me.
- (It) took me and came to this island, where it put me down.
- I know nothing now, this is a foreign place.
- How I came here, why I came here, I don't know."
- (The man) says: "Dear youth,... I am the King of the Fairies.
- That dove that brought you here was my daughter."
- (She) said: "I want to marry a human.
- And I said go and find yourself someone who is to your liking and bring him here, I will betroth you to him.
- For that reason we brought you here."
- "Well that's fine," (he) says.
- "If you brought me here with that intent, then I will accept."
- "But" says (the King) "I have one condition, I have one condition.
- If you fulfill this condition of mine then the matter is settled."
- (He) says: "Tell me what your condition is?"
- (He) says: "My condition is that I will marry you (two).
- You will be man and wife. But for forty days you will sleep in the same bed, but you will not be intimate with one another, after the forty first day, you are free to do as you please."

- 0042 *Ê de insanoxlî ye.* Well of course he was of flesh and blood.
- 0043 *Rokî îdare dike, dudu îdare dike, sisê îdare dike.* One day he was able to endure it, two days, three days.
- 0044 *Li bedewîya qîza şahê perîyan mêze dike, li zeynet û xemilandina wî û oda wî û.* When he looks at the figure of the daughter of the King of the Fairies, her jewels and the decorations of her room and...
- 0045 *Tahmûl û îdare jê ra çenabe.* He has no patience and endurance.
- 0046 *En fazle, en zor dide xwe, penc, şeş roj dewam dike.* He forced to the utmost himself (to endure), five, six days it goes on.
- 0047 *Êvarekî dibê: "Jinik" dibê "ha", dibê "heyran rind e (...) nika êdî sakincakî di orta min û te da nemaye.* One evening he says: "Wife", "yes?", "Heyran, it's fine, now there are no further reservations between you and me.
- 0048 *Em ê hevdû bin.* We belong together.
- 0049 *Pekî ewe çi şertekî giran bavê te danîye orteyê, gotîye cil ro, yanê îro be, çi dibe?"* Now what is it about this important condition which your father imposed, he said 40 days, but if it were, let's say, today, so what?"
- 0050 *Keçik de dibê: "Tu deqekî musade bike, hetanê ez têm."* Now the girl says: "You excuse me for a second, until I come back."

3.2 Utterances 0051–0100

- 0051 *Keçik radibe, derî veke derdikeve dere cem bavê xwe.* The girl gets up, opens the door and goes outside to her father.
- 0052 *Dibê: "Bavo, wele însanê me girt xwedîyê sozê xwe derneket. Teklifa wê yekê li min kir."* She says: "Father, that man that we took turns out not to be a man of his word. He has made an (indecent) proposal to me."
- 0053 *"Ê" dibê, "qîza min here gazî ke bila were."* "In that case" (he) says, "call him that he may come, my daughter."
- 0054 *Tê û dibê: "Bavê min gazî te dike."* She comes and says: "My father summons you."
- 0055 *Radibe, xwe tev girêdide tere.* He gets up, dresses [lit. binds himself together] for going outside.
- 0056 *Dibê "Kurê min, te çima waha got, ne şertê min û te heye, gerek çil royê tu bima?"* (The King) says: "My son, why did you say such a thing, was there not an agreement between you and me, that you should wait 40 days?"
- 0057 *Dibê: "Wele paşa min îdare nekir, ji eşq û hezkirina qîza te ez dayanmiş nebûm."* He says: "By God, Pasha, I could not manage to endure it for the love and longing for your daughter.
- 0058 *Min îdare nekir, lewma ew teklifa lê kir."* Because I couldn't cope I made her that proposal."
- 0059 *Dibê: "Ew cîyê kû tu lê pêya bûyî, here wê derê."* (He) says: "That place where you descended, go there.
- 0060 *Cardin ew kevok, ewê te bibe dayne ser minara te, bide rê were."* Once again that dove, it will take you and put you down on your minaret, then turn back and return."
- 0061 *Çara wî nîne.* He has no solution.
- 0062 *"Yahu, eman, zeman min tiştêkî nekir, min xetakî nekir, sadece min ev teklifa lê kir."* "Look, you know, I did nothing, I have committed no sin, I simply made that suggestion to her."
- 0063 *Dibê: "Na, tu xwedîyê sozê xwe nînî."* (He) says: "No, you are not a man of your word."
- 0064 *Tere wê derê, ew kevok tê wê derê, bi nigê kevokê digre, cardin tîne datîne ser minarê.* He goes to that place, that dove comes there, he takes the dove by the leg, once again it brings

- 0065 *Bila ew li wir biskine. Îcar, rokî paşa wezîrê xwe dişîne çarşuyê, dibê:* Let us leave him there [addressed to the listeners]. At that time, one day, the Pasha sends his viziers to the market, saying:
- 0066 *”Hûn ê herin sê merifan ji min re bigrin bînin werin. Sê merifên önemli.”* ”You will go and fetch three men for me, three important men.
- 0067 *Dibê: ”Paşa sê merifên çere?”* (The vizier) says: ”Pasha, what sort of three men?”
- 0068 *Dibê: ”Ê kû awa ilgî çekîcî. Ê dikkata we dikşîne, dikkatê dikşînin ser xwe, hûn sê merifan ji min re bigrin, bînin.”* (He) says: ”Those who draw one’s attention, who attract your interest, draw attention to themselves, three such men you will find and bring for me here.”
- 0069 *Wezîr terin, di çarşî de digerin, bal-a xwe didinê merîfekî li ber minarê sekinîye, dikene, şadibe, direve direve tere diharê minarê.* The viziers go and search in the market, they notice a man waiting on the minaret, laughing, rejoicing, he rushes up to the top of the minaret.
- 0070 *Ûor da, madê wî xirab dibe, digrî, hêsirê xwe paqij dike û jorda tê jêrê.* At the top, his mood worsens, he cries, he descends from the minaret wiping the tears (from his face).
- 0071 *Wana epêce lê mêze dikin, hey karê wî were ye.* They observe him for a fair while, seeing that this is how he passes his time.
- 0072 *Dibê: ”(...) evî merîfî bînin werin.”* (The chief vizier?) says: ”Take that man and bring him here.”
- 0073 *Ewî digrin tînin* They fetch him.
- 0074 *Ewa hinekî di çarşî de dimeşin.* They walk around in the bazaar for a while.
- 0075 *Terin, bal-a xwe didinê merîfekî demircîkî kurika xwe saz kirîye demir dikute.* They notice a blacksmith who has set up his workbench and is working iron.
- 0076 *Sor dike, dikute, haceta çêdike.* He heats it red-hot, beats it, makes tools.
- 0077 *Carê carê ew mezê dike demirê xwe yê sor û kakuçê xwe davêje û direve paşîya dikkana xwe.* Every now and again he look at his glowing iron, throws down his hammer and runs behind the back of his shop.
- 0078 *Qûçekî xwelî li wir e.* There is a pile of ashes there.
- 0079 *Xwe davê ser xwelîyê, topdike dide ber xembêza xwe, dibê ”zêrê min, ox zêrê min” û radibe bal-a xwe didê xwelîyê di desta da û vala dike, madê wî xirab dike û cardin tê ber kurika xwe, saz dike.* He throws himself on the ashes, spreads them on his breast, crying ”my gold, oh my gold!”, then realises that it is ashes in his hands, he empties his hands, his mood worsens and he comes back once again to his workbench, working at it.
- 0080 *Karê wî were ye.* He passes his time in this manner.
- 0081 *Dibê: ”Ewîya jî bigrin bînin werin”. Ewî jî digrin tînin.* (He?) says: ”Fetch me that one too!” They fetch him.
- 0082 *Tên sona serê çarşî, bal-a xwe didinê merîfekî bi herdû çavan kor e.* They reach the end of the bazaar and notice a man blind in both eyes.
- 0083 *Destê xwe vekirîye, dilencîtî dike, parsê dixwaze.* He has his hands open, begging, asking for alms.
- 0084 *Wezîr gunehê wî pir pê tê, bal-a xwe didê xortekî yaşikli bedew, li ser xwe lê herdû çavê wî tunin.* The Vizier takes great pity on him, he sees a young man, handsome and well-formed, but both his eyes are missing.
- 0085 *Digre zêrekî dike kefa destê wî.* He places a piece of gold in the palm of his hand.
- 0086 *Dibê: ”Ey insan, berîya sedeqê şimaqekî li vira min xe, şimaqekî li vira min xe paşê bide min.* (The beggar) says: ”Hey fellow, before (you give me) alms give me smack here, a smack here, afterwards you give me the alms.”
- 0087 *Wezîr sar dibe di cîyê xwe da: ”Ew çîye” dibê.* The Vizier is rooted to the spot [lit. ’gets cold on

- "Ez sedeqê didim te ma çima li te xînim."
- 0088 Dîbê: "Na xêr, kî sedeqê dide min, gerek a du şîmaqa li min xe"
- 0089 "Yahu etme eyleme."
- 0090 Dîbê: "Na, çara wî nîne, ez nagrim, gerek tu du şîmaqa li min xî, paşê bidî min."
- 0091 Çare lê nabîne, dîbê: "Evîya jî bigrin, bînin."
- 0092 Wan her sê merîfan digrin dibin terin cem paşê. Paşê gazî mele dike berê evil.
- 0093 Tu çima dikenî, direvî dîharê minarê, jorda madê te xirab dibe tu tê jêrê.
- 0094 Min çer serîda ji we ra got, mesela vî û qîza şahê perîyan, ji serîda ji paşê ra dîbê hal û mesele aha.
- 0095 Niha min anî hat danî vira.
- 0096 Ew bedewîya qîza şahê perîyan, ew xemilandina oda wî, ew zînet û zêr û xîş û emaretê wî dikevin bira min.
- 0097 Ez tîm ber minarê, ji min vetrê kewa min li wê derê ye.
- 0098 Ez direvim direvim terim wê derê, û ez bal-a xwe didimê lê ber çavê min kew firdide tere û destê min nagihêje.
- 0099 Ew acîya wî dikeve zîkê min ez jorda digirîm tîm, karê min ewe (...) ez bûme aşixê wî, sibê zû terim ber minarê, heta dibe êvar.
- 0100 Evarê tîm serê xwe datînim. Destê min ji karê dinyayê qetîya ye.
- his spot'], saying "What's this about, I give you alms, why should I strike you?"
- (The beggar) says: "No thanks, if you give me alms you must strike me twice."
- "Don't be like that!"
- (The beggar) says: "There is no other way, I won't take the alms, you must strike me twice, afterwards you give me the alms."
- He sees no solution to the problem, and says: "Bring this one too!"
- They take all three men and lead them to the Pasha. The Pasha summons the Mullah to him first.
- "Why is it that you laugh, run up to the top of the minaret, at the top your mood worsens, you come down again?"
- Just as I told you, the story of the man and the daughter of the King of the Fairies, from the beginning he tells the Pasha the matters.
- "Now I have been brought and left here."
- "The figure of the daughter of the King of the Fairies, the decoration of her rooms, the beauty and the gold and jewels and her emaret (unclear) come into my mind.
- I come to the minaret, I feel as though my dove is there.
- I run and run, going to that place, and I see how the dove takes to air just in front of me and flies off, and my hand fails to reach her.
- The pain of it fills my stomach, I am crying up there, I come (down?), that is my lot, I have fallen in love with her, early in the mornings I go to the minaret until evening falls.
- At night I lay down my head. My hands are cut off from worldly concerns."

3.3 Utterances 0101–0150

- 0101 Dîbê: "Tu derkeve here, de bi derdaye. Işê te temam.
- 0102 Gazî demîrcî dikê, dîbê:
- 0103 "Demîrcî, tu çima li ber kurika xwe disekinî, dixebitî, kardikî, tu çarî-carî davêjî direvî paşîya dikana xwe, quceki xweli li wê derê ye tu xwe davê ser û dibêjî "ax zêrê min"?"
- 0104 Û tu carek din kor û poşmam dizivirî ser kurêka xwe. Sebebê wî çî ye?
- 0105 Dîbê: "Paşa. Ez demîrcîme, hedadim. Hacetan çêdikim. Her roj zarokê min nanê min ê nivroyê, xwarina min dihatin danîn
- (The Pasha) says: "You may go outside and leave, you have great problems, the matter is finished (for us now)."
- He calls the blacksmith, saying:
- "Blacksmith, why do you stand in front of your anvil, working, every now and again you throw down (your hammer), run behind your shop, there is a pile of ashes there on which you throw yourself saying: "Oh my gold!"
- And then you come back to your anvil, down-cast and regretful. What is the reason for this?"
- (He) says: "Pasha, I am a blacksmith, a hedad [synonym], I make tools. Every day my children bring me my lunch, place it at the shop, they

- dikanê. Ji min ra danîn.
- 0106 Ew roj min go: "Îroj ji min re xwarinê neynin, ez ê bi xwe li çarşiyê bixwim."
- 0107 Min go: "Ez ê çî bînim werim?"
- 0108 Min çû mirîşkekî kirî anî hat.
- 0109 Kurika min agirê min, koza komirê pire, min anî li ser sor kir, pijand.
- 0110 Min nanê xwe danî ber xwe, ez rûniştim ser. Min bal-a xwe dayê, pişikêkî reş hat ji min re got "Selamu aleykum".
- 0111 Min aha lê mêzekir. Min go: "Heyran tu heywan, tu pişik. Tu çawa ji min re dibê selamu aleykum?"
- 0112 Got: "Ez pişik nînim, ez dewleta te me."
- 0113 Min got: "Tu çawa dewleta min î?"
- 0114 Got, ji min re got: "Tu nîvekî wî mirîşka xwe bidî min ez bixwim. Ez dewleta te me."
- 0115 Min ji xwe ra got: "Ev pişînga min dixapîne. Eva dikura dibe dewleta min."
- 0116 Ê got: "Hêteki bide min, min bi der nede. Binêre ez dewleta te me, min bi der nede."
- 0117 Go, min got: "Bo xwedê ez hêtekî jî nadim te."
- 0118 Ê got: "Baskekî bide min. Binêre ez je te re dibêmin min bi der nede."
- 0119 Got ez dişinmiş bûm, min go yahu eh (...) heyvan di kura hatiya, ew sêrbaze çîye hatiye bûye miselletê serê min. Got, min got: "Bawo bi xwedê ez baskekî jî nadim te."
- 0120 Ê got: "Hemin tu nadî, nadî, ew hestîyê ku tu dikoji û tu naxwî û tu digrî davêjê, ewan hestîya qe ne ka bide min, ez bixwim. Min bi der nede."
- 0121 Go, min got: "Wele min hestî jî neda te". Min rabû hestîyê xwe topkir, kir hundirê kurika agir, agir da binî, ew hestî jî şewitandin û min tişteki nedayê.
- 0122 Go: "Wexta pişîng wenda bû, ez hatim (...) paşîya dikana xwe mêzekir, bal-a xwe dayê min dit kuçekî zêr wayê li wir e."
- 0123 Go: "(...) ez direvim xwe davêjim ser, ez dibêmin "zêrê min", ez topdikim didim ber hembêza xwe, destê min da dibe xwelî.
- 0124 "Aha" dibê "Xwelî valadikim wê derê. Nexweşîya min jî ev e, ketîye canê min, ji canê min dernakeve. A wele, karê min û xwelîyê jî ev e."
- 0125 Dibê: "Tu here, te jî bi derdaye, tu jî derkeve here."
- bring it for me.
- That day I said: "Today don't bring me any food, I will eat something myself in the market."
- I said (to myself): "What shall I fetch?"
- I went and bought a chicken and brought it back.
- My anvil, my fire, there is plenty of embers in the coal, I put the chicken over the glowing embers and roasted it.
- I placed my meal in front of myself, sat down. I noticed that a black cat had come and said to me "Selamun aleyhkum."
- I looked at it like this, saying: "Heyran, you are an animal, a cat, how can you say to me Selamun aleyhkum?"
- (It) said: "I am not a cat, I am your country."
- I said: "How can you be my country?"
- (It) said to me: "You give me half of that chicken, I am your country."
- I said to myself: "That cat is fooling me. How can it be my country?"
- Then (it) said: "Give me a leg (of the chicken), don't let me leave, I am your country, don't let me leave!"
- I said: "By God, I won't give you a leg."
- And it said: "Give me a wing, look, I say to you, don't let me leave (without helping me)."
- I thought to myself, I said, well... where does the animal come from, what this sorcery that has come to trouble me. I said: "Old chap, by God I won't give you a wing."
- Then (it) said: "If you won't, you won't, but at least give me the bones that you chew but don't eat and then throw away, that I may eat them. Don't let me leave here."
- I said: "By God I won't give you the bones either." I got up and gathered the bones, put them in the furnace of my workbench, set fire to the bottom of it, and burned those bones, I gave him [= the cat] nothing."
- He said: "When the cat had gone, I came behind my shop and looked seeing that there was a pile of gold there.
- I run and throw myself on it, saying "my gold!", I gather it and rub it onto my breast and in my hands it becomes ashes."
- "Thus" he says, "I empty the ashes there." [interpretation unclear] My ailment is such, it has come into my spirit and does not leave it. By God, this is the matter of me and the ashes."
- (The Pasha) says: "You may go, you are in dire straits, you too may go outside and leave."

- 0126 *Gazî ê kor dike, dibê: "Xortê baş, tu bi herdû çavan kor î. Xelk sedeqê dide te, tu çima dibê du şîmaqa li min xînin paşê sedeqê bide min.* He summons the one who is blind, saying: "Dear boy, you are blind in both eyes, the people give you alms, why do you say that they should strike you twice before they give you the alms?"
- 0127 *Ew xêr wî guneyê dernayne. Êdî çima sedeqê didin te, wexta li te dixinin."* This charity does not outweigh that misdeed. Now why do they give you alms if they (also) hit you?"
- 0128 *Dibê: "Paşa, heqê min e. Min musteheq kirîye, lewma ez dibêjim."* He says: "Pasha, I deserve it, I earned (such treatment), that's why I say so."
- 0129 *Dibê: "Te çi kirîye?"* (The Pasha) says: "What have you done?"
- 0130 *Dibê: "Bavê min merifekî pir tucçar bû, pir zengîn bû. Ez cahîl bûm, xort bûm, bavê min ket mir.* (He) says: "My father was a great merchant, very wealthy. I was young and foolish when my father passed away.
- 0131 *Ew varîdata bavê xwe, ew sermîya bavê xwe, perê bavê xwe, zêrê bavê xwe min temam di rêya kêfê, zewqê, exlencê da xerç kir.* That yearly income of my father, that capital, that money, that gold of my father, I spent it all on pleasure, amusement and fun.
- 0132 *Tiştê min nema, ez were feqîr ketim, bê îdare ketim.* Not a thing was left to me, I fell into such poverty, I had no means of subsistence.
- 0133 *Êdî ji tan û niçê cînara jî, min di mala xwe da star nebûm, min îdare nekir.* And the scolding and the reprimands of the neighbours meant that I had no peace in my house, I couldn't stand it any longer.
- 0134 *Ez nanê muhtac bûm, kesî xêr û sedeqa xwe jî neda min."* I was in need of food, and there was no one to give me charity or alms."
- 0135 *Dibê: "Di mesafekî kin da, nêzîk da min ew mala bavê xwe temam wenda kir, ez mam feqîr, belengaz, birçî mam."* He says: "Within a short time, a brief period, I lost the entire household of my father, I was left poor, destitute, hungry."
- 0136 *Dibê: "Çara min nema, êdî kesî xêr û sedeqa jî li min nekir.* He says: "There was no way out for me, no one would give me charity and alms.
- 0137 *Ez kuda çûm, min got: "Ez birçî me." xelkê got: "Lawo tu çima birçî yî, tu xortî, (...) tu eyp nakî dibê ez birçî me?"* Wherever I went and said I am hungry the people said: "Boy, why are you hungry, you are a young man, isn't it a disgrace to say that you are hungry?"
- 0138 *Dibê: "Min îdare nekir, çaresiz mam, şûrekî bavê min hebû, go min got: "Dayê hela wî şûrê bavê min bide min, ezê herim nanê xwe qezenc kim, aha nabe."* He says: "I could not cope, I was left without any remedy. My father had a sword, so I said: "Mother, won't you give me that sword of my fathers that I go and earn my daily bread, it cannot go on like this."
- 0139 *Got: "Min şûrê bavê xwe girt anî hat, ji pasê temîz kir, devê wî tûj kir =û ez çûm çîyê, min xwe da serê rê.* He said: "I took my father's sword, derusted it, cleaned it, sharpened its edges and went to the mountains where I settled myself at the side of the road."
- 0140 *Min got: "Va rêya tucçara ye, di vir ra terin tèn.* I said (to myself): "This is the road of the merchants, they come and go past here.
- 0141 *Ez ê tucçara bişêlinim, pera jê bistînim, bînim werim bixwum, çara min nemaye êdî."* I will rob merchants, take money from them, bring it back and live from it, I have no choice any more."
- 0142 *Go min xwe daye serê rê, çîya ye, suwar(ê) têra tere.* Thus saying I set myself up at the road, it was mountainous, a rider was passing along it.
- 0143 *Min bal-a xwe dayê, merifekî, tucçarekî, suwarê devekî ye, heqîbekî li binîye, wol (?) jî wêda tê.* I noticed a man, a merchant, mounted on a camel, there was beneath him a saddle bag, coming from over there.
- 0144 *Go min da pêşîyê, min got "Ev deva min e. Tu* I went up behind him saying: "That camel is

- deva min kuda dibî terî?”*
- 0145 *Mêrik, merifekî bakilî, zana bû. Got: “Bavê min, deva te ye. Ez bi yanîşî lê suwar bûme. Kerem ke deva te bila ji te ra be.”* mine. Where are you taking my camel?”
The man was a man of common sense, of wisdom, he said: “Old fellow, the camel is yours. I was riding it by mistake. Please, may the camel be for you.”
- 0146 *Mêrik pêya bû, heqîba xwe da ser milê xwe, deve da min.* The man dismounted, slung his saddlebag over his shoulder and gave me the camel.
- 0147 *Ez suwarê devê bûm. Min got: “Îcar ez mêrik berdîm, mêrik ê here malûmata bide esker, bide polîsa.* I mounted the camel and said (to myself): “If I let the man go he will go and inform the army, the police.
- 0148 *Ewê werin xwe bigihînin min, min li çîyê bigrin.* Then they will come and surround me, arrest me on the spot.
- 0149 *Ezê çawa bikim. Ezê wî merîfa bibim herim serê çîyê, bidim rûniştandinê.* What shall I do? I will take this man and go to the top of the mountain and make him wait there.
- 0150 *Heta bila bibe êvar. Ezê êvarê berdîm. Ew li vî alîya here, ez li vî alîya terim.* Until evening comes. In the evening I will release him, he will go this way, I will go that way.
- ### 3.4 Utterances 0151–0200
- 0151 *Hetanê bibe sibê ez rêça (?) xwe wenda dikim. Mêrik nagîne min.”* By morning I will have concealed my tracks, the men won’t catch me.”
- 0152 *Dibê: “Min qederekî mêrik di çîyê da, da peşîya xwe, bir. Min got: “Ew heqîba çîye li ser milê te?”* He says: “I made the man walk in front of me for a while on the mountain (?), I said: “What is that saddle bag over your shoulder?”
- 0153 *Got: “Wela ew jî zêrin”* He said: “By God, it’s (pieces of) gold.”
- 0154 *Min got: “Mala te ava be ji xwe ez li zêra digirim. Ez devê çerdikim. Ka wî heqîba min jî bide min.”* I said: “May your household thrive, I am looking for gold for myself. What should I do with a camel. Won’t you give me my gold?”
- 0155 *Heqîb jî girt, da min. Min mêrik bir çû, deranî, diharê serê çîyê.* He took the gold and gave it to me. I led the man on, took him to the top of the mountain.
- 0156 *Min got: “Ezê êvarê berdîm”* I said (to myself): “In the evening I will let (him) go.”
- 0157 *Ez saeteki, du saet, sê saet rûniştîm.* I sat waiting for one, two, three hours.
- 0158 *Min got: “Welle ez sebir nakim hetanî bibe êvar. En îyîsî ez wî merîfa bikujim. Kî hay jî min heye. Ezê wî merîfa bikujim.* I said (to myself): “By God I haven’t the patience to wait until evening. The best thing would be for me to kill this man. Who knows about me? I will kill this man.
- 0159 *(...) rê herim, çima heta êvarê biskînim.* (?) I will set off and go, why should I wait until evening?
- 0160 *Mala min birçî, zarokên min birçî, ez bê perê . Min çav dayê heqîbekî zêr, tijî. Ez êdî sebir dikim.* My household, my children are hungry, I am penniless. I cast my eye to the bag of gold, it was full. Now I would be patient (interpretation unclear)
- 0161 *Min got: “Mêrik welle ezê te bikujim”* I said: “Man, by God I will kill you.”
- 0162 *Got: “Bira, te deve xwast min da te. Te zêr jî xwast min da te. Ka tu çima min bikujî?”* He said: “Brother, you demanded the camel and I gave it to you. You demanded the gold and I gave it to you. Then why will you kill me?”
- 0163 *Min got: “Welle ezê te bikujim”* I said: “By God, I will kill you.”
- 0164 *Got: “Xortê delal min nekuje. Ez merifekî tucçarim, zengînim. Ez ê heqîbekî zêrê din û devekî din jî ji te ra bînim, werim, min nekuje.”* He said: “Dear youth, don’t kill me. I am a man of commerce, I am rich. I will bring you another saddlebag of gold and another camel, don’t kill me.”

- 0165 *Min got: "Welle ezê te bikujim"* I said: "By God, I will kill you."
- 0166 *Ûi min ra got: "Ezê du heqîb zêr, tevî du deveyên din ji te ra bînim."* He said to me: "I will bring you two saddlebags of gold together with two more camels."
- 0167 *Min dîsa got: "Welle ezê te bikujim"* Again I said: "By God, I will kill you."
- 0168 *Mêrik hetanî hefta say kir, got: "Ezê heft heqîb zêr, tevî heft deva bidim te, min nekuje."* The man counted up to seven, saying: "I will give you seven bags of gold together with seven camels if you don't kill me."
- 0169 *Ez tucçarekî zengînim. Ûi min ra hayat lazim e, ji min ra zêr lazim nînin.* I am a wealthy merchant, my life is dear to me, I do not need gold.
- 0170 *Sirf [UNCLEAR] min hebe, bila zêr gi ji te ra bin.* Let there only be [unclear], for you there will be all the gold.
- 0171 *Teqeta min, kuvveta min [UNCLEAR] heft heqîb zêr, heft deva ezê bidim te sirf tu min nekuji, çoluk-çocuxê min heye, ez gune me."* My strength, power [unclear], seven saddlebags of gold, seven camels I will give to you if only you don't kill me, I have children and family, have mercy on me."
- 0172 *Min got: "Bi sûnda Kur'anê ezê te bikujim."* I said: "By an oath on the Quran, I will kill you."
- 0173 *Go son olarak çare di destê mêrik da nema. A wî saetê ezê mêrik bikujim.* In the end no solution was left for the man, I would kill the man at that time.
- 0174 *Got: "Xortê delal, (tu) min nekuje, ezê hedîyekî bidim te, di dinyayê da tu kesî ji kesî ra nekiribe."* (He) said: "Dear youth, don't kill me, I will give you a present such that no one in the world has bought / not made for anyone else."
- 0175 *Min got: "Ew çîye?"* I said: "What is it?"
- 0176 *(Go) dermanekî ji cêba xwe deranî go: "Ez wî dermanê dikim çawekî te. Tu li wî çîyê bisekinî, li çîyayê dinê mêş firbidin, tu yê bibînî."* He took an ointment (remedy) out of his pocket saying: "I will put this ointment on one of your eyes. When standing on this mountain you will be able to see the flies buzzing on another mountain."
- 0177 *Mar bi rê da herin tuyê bibînî. Tu li diharê çîyê bisekinî, di nava çarşîyê da tuyê merîfa nasbikî.* When snakes are going on the road you will see them, when you are on top of the mountain you will recognize the people down in the market-place.
- 0178 *Ez ê qencîkî were jî ji te ra bikim. Sirf tu min nekuji."* I will impart this wonderful gift on you, but only if you do not kill me."
- 0179 *Min got: "Baş e"* I said: "So be it."
- 0180 *(Go) anî hat derman kir çavekî min.* He brought the ointment and put it on one of my eyes.
- 0181 *Wexta min çavê xwe vekir, belê. Çikas şehrekî dûr hebe, insanê wî, ku ez nas bikim, di navda, ez nasdikim.* When I opened my eyes, it was true. However far away a town was, its people, that I recognized, in the middle of the town I recognized them.
- 0182 *Ez li çîyê mêze dikim. Mêş firdidin ez dibînim, min got: "Têke cavê min ê din jî." (interruptions)* I looked at the mountain, I saw the flies buzzing around, I said: "Rub it into my other eye as well."
- 0183 *Îcar got: "Heyran, ez têkim cavê te yê din jî, her du çavê te kor dibin."* This time he said: "Heyran, if I rub it on your other eye as well, both of your eyes will go blind."
- 0184 *Ûsula wî dermanê hanê ji çavekî ra mahsuse, ne ji herdu çavan ra."* It is the particular feature of this ointment here that it is specially for one eye, not for both eyes."
- 0185 *Min got: "(...) bi sûnda kur'anê ezê te bikujim tu nekî çavê min ê din jî." (...)* I said: "By the Quran I will kill you if you do not put it on my other eye as well."
- 0186 *Got: "Lawo neke. Tu xortekî heyfî, kêfa min ji te ra tê, tu yazixî, min heqîbekî zêr daye te, ji min kêma nabe. Ez zengînim, tişteki nabe."* (He) said: "Boy, don't do it, you are a vengeful young man [interpretation unclear], I like you, it would be a pity (for you to end like that). I gave

- 0187 *Tu jî fena ewladê min. Were wê yekê neke. Ez têkim çavê te yê din, herdu çavê te jî kor dibin. Tu guneyî.* You are like my own son, come, don't do this thing. If I rub it on your other eye, both of your eyes will go blind, you would be pitiful.
- 0188 *Mêrik zaf gunê xwe min anî, min dinlemiş nekir.* The man took great pity on me, I didn't listen.
- 0189 *Min got: "Têke çavê min ê din jî, tu nekî çavê min ezê te jêkim." Go min şûr da ser qirikê.* I said: "Rub it on my other eye as well, if you don't put it on my eyes I will cut you (from your head)". Thus saying I placed my sword on his neck.
- 0190 *Got: "(...) lawo, min nekuje. Ezê têkim cavê te yê din jî.* He said: "... boy, don't kill me. I will rub it on your other eye as well."
- 0191 *Rabû serê min danî ser çoka xwe, derman kir herdû çavê min jî.* He got up and placed my head on his lap, put the ointment on both of my eyes.
- 0192 *Ez rabûm, go, min dît çavê min korin. Herdû cavê min korbûn.* I got up and realised that both of my eyes were blind. Both of my eyes were blind.
- 0193 *Mêrik, şûrê min ji destê min girt, heqîba zêrê xwe jî ji min stend. Deva xwe jî ji min stend. Şîmaqekî li vira min xist, got "Eva heqa te".* The man took my sword from my hand and took his bag of gold from me, and his camel. He struck me a blow, saying "That is what you deserve."
- 0194 *Yek jî li vira min xist, got: "Eva jî musteheqa te lawo. Min heta heft heqîb zêr da te, min got "min nekuje, varîdatekî girane, heft heqîbê zêrê xwe bîne bigre here mala xwe.* He struck me another blow here, saying: "That too is what you deserve. I gave seven saddlebags of gold to you, I said: "Don't kill me, that is a large sum, take your seven bags of gold and go home.
- 0195 *Tu çi ji min dixwazî, cima min dikujî. Tu [UNCLEAR] nebû. Tu yê îcar here bi xwe."* What do you want from me, why were you going to kill me, you [unclear], now go on your way."
- 0196 *Got "Welle paşa, mêrik min suwarê dewê jî kir, anî li perê şehre min danî û da rê kir çû.* He said: "By God, Pasha, then the man mounted me on the camel, brought me to the outskirts of my town and set me down, set off on his way and went.
- 0197 *Go ez mame kor, go niha ez destê xwe vedikim, kî sedeqê bide min, ew tê bira min.* So I was left blind, now when I open my hands that (people) will give me alms, he comes to my mind.
- 0198 *Ez dibêm eyn fena mêrik, yek heqê min, yek musteheqa min.* I say just like the man, I deserve one, one is my reward.
- 0199 *Hûnê du şîmaq li min xin, paşê sedaqa xwe li min bikin.* You will strike me twice, afterwards you will give me my alms.
- 0200 *Wele eva jî ewha.* By God that one too is like this.

Multi-CAST

Multilingual Corpus of Annotated Spoken Texts



multicast.aspra.uni-bamberg.de/